## Ji bo Kurdan hertim roja zimanê dayikê ye

»»» R:7




## Dîrok dersa lêfêrbûnê ye

»»» R:3

## *Grîngiya parastina zimanê dayîkî*

»»» R:4

## Partiya Demokrat û girîngîdan bi pirsa jîngehê

»»» R:5

*Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

# Agirî

*Duheftînameyek Siyayasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî*
*www.agirimedia.org Hejmar (416) 21-02-2022 Buha (1000) Tûmen*

# Çîroka serokê gendelan ber bi dawiyê ve diçe

**Di heyamên derbazbûyî de, faîlek ji dengê berpirsên Spaha Pasdaran belav bû ku, tê de talankirina sîstematîk a eniya ewlehî û leşkerî ya welat Spaha Pasdaran li asta herî bilind de xwe derxist.**



Faîlek ku tê de rol û dewra kesên ku qehreman dabûne naskirin yên weke terorîst Qasim Sulêmanî jî jixwe girtibû. Herçend ku nûçegihaniya Fars û hejmarek kesen din li berprisên Spaha terorîst li derheq rastbûna wan axavtinên ku di navbera Mihemmedelî Ce`iferî û Sadiq Zoliqedirîniya hatibûne kirin helwêst girtin lê, her çavan ku dihate çavnhêrkirin, Elî Xamineyî, weke serdestê talankerên rejîma Îslamî, helwesteke cuda girt û bi sûda berevanîkirin ji gendelkaran de axavt. Her bi vê sedemê Xamineyî li heyama derbasbûyî de ku ne gelek dûre nîşan daye, çawan bi perdê talançiyên hevalbendên xwe dipeçêre û dijmn ku (niha jî, zelal nebûye ku çi aliyek dijmine!) bixtanên wuha dike.

Di heyama Rêbendana sala 1391`an de jî, faîlek ji dengê rişwet vergirtina birayê Sadiq Larîcanî yê bi navê Babek Larîcanî hate belavkirin ku piştre, Xamineyî li derheq wê faîlê de got: Ew yeka lidijî exlaq, şeri` û yasayê ye! Û nabe behsa wê bê kirin.

Vê carê nav zirav ragihandiye ku, odeyên hizirî yên dijmn dixwazin li dijî Spah û Qasim Sulêmanî “Lecen perakenî” bikin. Ev li odeyên hizirkirinê yên xwe de, çendîn milyard Dolar mizaxte dikin û hewl didin da ku ciwanên me li rêya givaşên aborî, gotinên vala û “lecen perakenî”, li rêya şoreş û îslamê dûr bixînin. Her carê êrîşî dikin li ser ciheke me. Rojekê stûnên şoreşê tohmetbar dikin ku, di pêşkevtina şoreşê de rol hebûne, rojekê mecilsê dikin armanc, ev odeya din ya Şêwra Nobedar û wê carê jî dewr gihîştiye Spah û Qasim Sulêmanî!

Di vê faîla 49 deqeyî de ku, li salroja talankirina şoreşa gelên Îranê de hate belavkirin, Mihemedelî Ce`iferî û Sadiq Zolqediriniya behsa gendeliya berfireha bi qasî çend milyard Tumenî ya di nav avakera Te`avon a Spahê de hatiye encamdan dikin û herwisa rola Spaha Qudis û Waliyê Tehranê û hinek ji navendên din û li serweyî hemûyan Xamineyî bixwe ku bi wê gendeliya qirêj didin eşkere kirin. Di Faîlê de îşare bi vê yekê hatiye kirin ku, Elîxamineyî biryar daye ku, ji sedî 90 dahatên navendên Te`avon yên Spahê radestî Spaha terorîst a Qudsê bike. hewisa bas ji rola çalakbûna Qasim Sulêmanî yê terorsîtê navûdeng hatiye kirin ku piştî kuştina wî gelek hewl hatin dayîn da ku navbirî weke qehremanek bo dadperwerî û azadiyê bê pênase kirin.

Eva ku di vê navberê de, girîng û hewceye zêdetr helwest li dijî bê girtin nek faîl bixwe ye çimkû, bo hemûyan eşkere ye ku ev heyama salên dûrûdirêje, Spaha Pasdaran ji rêya rişwet vergitinên aborî ve, samana û dahata xelkê Îranê talan dike belkû, berevanîkirina rêberê vê rejîmê ji gendelkaran û talançiyên Spahê ye û berdewam bangeşeya vê yekê kiriye ku li ser rûyê erdê nûneratiya xwedê dike.

Li rastiyê de, ya ku niha Xamineyî dibêje netenê berevanîkirin ji Spaha terorîst û hejmarek destûpeywendiyên wî yên dinav navenda ne resen de ye belkû, şêwazek li paqijkirin û xwe dizîn ji vê barê giran yê berprisayetiya ku pisîra wî bixwe digire ye. Ji aliyekî din ve eger wuha binpeç bikin ku rewşeke azad û heta li ser lêvan li dadwerî li Îranê de hakim bibe (ku her tune ye) Elî Xamineyî weke kesekî ku agehdarê gendeliyên sîstematîk yên di nav mafyayên Spahê de ye divya ku bo dadgehê gazî bikirban. Lê, bi wî awayî hewla xwe avêtin li berpirsayetiyê dide û dixwaze aliyê kêm di nav wê alîgirên kêm û berxwer ku bo wî maye wuha nîşan bide ku, ez her ev dadwerê hertimî yê we me. Ev yek ji aliyekî û ji aliyekî din ve jî, Xamineyî bi wî şêwazî berevanîkirin, rasterast rêgirî dike li her cure bidûreçûnek li derheq dosyeyên gendelî ku li paşerojê de eşkere bibe çimkû, dizane eger bo dosyeyên wuha bidûreçûn bê encam dan ku rêjeya wan kêm nînin, wuha abiroiya li ser kevir ya serkirdeyên rejîmê diçe.

Bilî wan jî, Xamineyî baştir ji her kesekî din ew rastiya zaniye û jê fêm kiriye ku bi sedema kirdarên ne serdemyane û hovtiyên xwe û destêya di bin fermana wî de, xwediyê ti pêgeh û rewabûneke siyasî û civakî nînin û eger ew faîla jî li devê navbirî bi rastkirin, û bê nîşan dan an li hember de helwestekî wusa neyê girtin hinde din li cem xelkê bêzar dibin.

Koma wan behs û gotaran jî ev rastiya selmandiye ku, careke din bo didin eşkere kirin, çîroka temenê serokê gendelan, hevşêweya cama temenê Dêva di nav efsaneyan de ber bi dawiyê ve diçe û êdî kes nikare berevanî jê bike tenê bixwe nebe.

## Sergotar

### *Dirindeyî û fedînekirin*

**N: Kerîm Perwîzî**

Dema ku li nav peyvdanê Kurdî, Erebî, Îngilîzî û her kultûreke din de li pey peyv an kompeyvekê dikevî ku, kiryarên Komara Îslamî pê pênase bikî, dibînî li ti çand û kultûrekê de nikarî tiştekî hemkofê kiryarên dizî yên desthilatdarên Wilayeta Feqîh bibînî.

Dema ku ajelên dirinde birçî dibin, her dema ku nêçîra xwe dibînin demûdest êrîşî ser dikin û eger bi wan bê girtin an hêza wan pê bişkê, hilvedidirînin û dixwen da ku têr bibin. Êdî ji vê zêdetr êrîş nakin li ser ajeleke din, çimkî têr in! Li şerê di navbera mirovan de jî çi tak, çi tayîfe, eşîre û heta netewe, împratorî, evqas êrîşî li ser yektir kirine û yekitr kuştine heta ku yek ji wan li ser yê din serkevtiye. Êrîşên bi vî şêwazî, kompeyva êrîşkirina wek "Berber" bo bikar anîne, yan li navçeya Mizopotamiya, Zagiros û deşta di navbera Zagros û Efxanistanê de, ji wan eşîretan re ku weke tayîfa Daryûş mejûlê geriyan û kuştinan bûne, ji wan re gotine "Harî" yan girûpek ku berdewam dimeşin û êrîş dikin.

Lê Komara Îslamî rûyê tev dirinde û Hariyan spî kiriye! Li dirindebûn û encamdana tawanan de modelek din afirandiye ku kesên din gelek bi kêmî agehdarê bûne û li cîhanê de mînakên gelek kêm hene ku mifah jê vergirtibe.
Desthilata nemirovane ya Wilayeta Feqîh li hundir de gelek tirsnok e, ji ber tirisnokbûna xwe penahê ji her cure xwînmijînê re dibe da ku xwe biparêze. Bona vê

xweparastinê jî, penah biriye bo barimtegiritin û êrîşkirina nerasterast li dijî kesan da ku hesta mirovbûn û soziya wan birîndar bike û ji vê rê ve, wan teslîm bike.

fedînekirin û bêheyabûna wê gihîştiye astekê ku xelkê bêtawan binçav dike û li rêkkevtina navneteweyî û herwisa di danûstandinan de weke xaleke lihevkirinê bikar tîne da ku dorpêç li ser vêde neçin, ev wan barimteyên Rojavayî azad nake!

Li hundirê Kurdistanê de jî, nikare bi serkutkirin û tundtîjiyê li hemberî lehengên meydanên azadîxwaziyê de ser bikeve, dest diavêje bi gazîkirina malbatên wan û gefan ji wan dixwe û ji wan re dibêje zarokên xwe li nav refên xebatê derxînin! Ji vê dirindetir jî, bav, dêv, bira û xwişkên wan cangoriyên çeperên xebatê gazî dike û wan destbiser dike û herwisa bi hincetên nebicî wan li girtîgehan de xwedî dike û di dema îşkencekirinê de wan azar dide, tenê bona vê ku îradeya polayîn ya xebatkaran bi çok bîne.

Ev modela dirindebûnê ku di asta herî bêşermî û bêheyayî de bi rê ve dibe, ne tenê ku di nav ajelan de ti mînakek wuha tune ye, belkî li nav şerê Berberiyan û êrîşên Har ên Daryûşê Hexamenişî de jî, hemkofê wê nehatiye dîtin, û her bi vê sedemê ye jî, kultûra kompeyva mirovahiyê dema ku mêzeyî wan kiryarên desthilatdarên Tehranê dike, ecîbgirtî dibe.

# Peyama Lêpirsiyarê Giştî yê PDKÎ bi hilkefta roja cîhanî ya Zimanê Dayîkî



**Lêpirsiyarê Giştî yê Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê "Mistefa Hicrî", bi hilkefta 21`ê "Şibat"ê roja cîhanî ya Zimanê Dayîkî, peyamek belav kir.**

Deqa peyamê wiha ye:

Ziman şademara neteweyê ye

Zimanê me girîngtirîn nasnameya me ye, lewam Komara Îslamî pêşiya xwîndina zarokên me bi Zimanê Dayîkî digire da ku bi xeyala xwe, me di ziman û kultûra xwe de bihelîne.

Lê sedan mamaosteyên nîştimanperwer bi têkoşîna xwe nehêlane ew xewna rejîmê bê gorê û di vê derheqê de jî nirx dane.

Roja Zimanê Dayîkî li wan mamosteyan û dersxwanên hişiyar ên wan û tev xemxwarên Zimanê Kurdî pîroz be.

Mistefa Hicrî

1`ê Reşeme ya 1400`an a Rojî

20`ê Şibata 2022`an

# Dîrok dersa lêfêrbûnê ye



N: Nûredîn Sofîzade




Di jiyan û xebata nava her gel û kom û civatgehekê de, bûyerên girîng çê dibin û bi derbasbûna zeman ev bûyer wekî bûyerên dîrokî tênê hesibandin û ger encama wê bûyerê bi qazancê wê netewe û civatgehê bibe, bêguman ev netewe cehdê dike di pêşerojê de jî, wan kiryaran ku bûne sedemê çêbûna wê bûyerê bi awayekî baştir û erênî bikar bînin da ku bikarin ezmûn û serkevtinên xwe dewlemendtir bikin; mirov dikare bêje kiryarekî baş e di derbasbûyî de, dikare bibe ders da ku ev netewe yan civatgeh, pêşeroja xwe pê wê xala erênî ya dîrokî dewlemendtir bike.

Ji aliyekî dinê jî, ger di dîroka derbasbûyî de kar û kiryarekî nerênî û şaş hatibe encamdanê ku bibe sedemê xisargihandin bi hitbar û jiyan û xebata wê netewê û civatgehê, bêguman divê dîsan wê bûyera nerênî ya xwe bikine dersek baş da ku di pêşerojê de careke din ev bûyer û şaşî neyêne dubarekirin û hertim divê li ber çavan be û bibe ders.

Gelek kes hene ku li ser wê bawerê ne ku bûyerên dîrokî çi erênî yan nerênî bin, divê bêne piştguhxiştin û jibîrkirin, lê di rastî de ewa nerîn û baweriyekî şaş e û her kes û netewe û civatgehek ger bixwaze pêşerojeke serfirazane û serkevtiyan û bi bê şaşî hebe, bêguman divê ezmûn û bûyerên erênî û nerênî yên xwe hertim bîne bîra xwe û wekî dersekê bike çavkaniya lêfêrbûnê, da ku xal û bûyerên erênî bo çêkirina pêşeroja xwe bihêz bikin, û xal û bûyerên şaş û nerênî carek dinê dubare nekin ku dîsan bibe sedemê xisargihandin bi xwe û civatgeha ku ev tê da dijî.

Di dîroka netewa me de jî bêguman gelek bûyerên baş û xirab çê bûne ku renge sebebkarê sereke yê çêbûna wan bûyerên dîrokî em her bixwe bin, bi taybetî ger em mêzeyê dîroka dûr û dirêj a xebata siyasiya gelê xwe bikin ku bona rizgariya Kurd û Kurdistanê bi rê ve çûye, dehan û sedan bûyerên girîng ên dîrokî çêbûne ku piranî bi sedem û ji aliyê me xwe ve çêbûne û qewimîne.

Dema ku em dibêjin wan bûyerên dîrokî, divê bo me û çêkirina pêşerojeke baş bibine ders û cihê lêfêrbûnê, ewa ku hewce ye û erkê me ye ku li ser wan bûyeran hertim wan xalanên jêrîn ji bîr nekin.

1 - Bi çavê rexne bera xwe bidinê.

2 – Xalên erênî û nerênî yên wan bûyeran nas bikin û ji hev cuda bikin.

3 – Cehdê bikin xalên erênî bona çêkirina pêşerojê bihêz bikin û hevdem xalên nerênî lawaz bikin heya asta jinavbirinê.

4 – Em divê berpirsayetiya rola xwe li ser çêbûna wan bûyerên erênî yan nerênî qebûl bikin.

5 – Ger bi sedema berpirsayetiya me û çêbûna bûyerekê ku xisar gihandibe civatgehê û yan derbe li tevgêrê dabe, divê em bi dilekî vekirî û zêdebarê qebûlkirina wê berpirsayetiya xwe, daxwaza lêborînê jî bikin.

6 – Ger bi sedema me ve bûyerek çê bibe ku erênî be û bibe hegera serkevtinê, bêguma divê em şanaziyê bi xwe bikin ku bibe handerek bo çêkirina pêşerojeke baş, li ser hemen kar û pêbendiya bi pirensîpên erêniyên xwe bimînin û di encamdana karê baş de berdewam bin.

Ku wisa ye bi berçavgirtina wan 6 xalên serve, em dikarin bêjin me derbasbûyiya xwe îcar çi baş yan xirab, bo xwe kiriye ders. Di nava tevgera rizgarîxwaziya gelê Kurd de û li dîroka pir ji evraz û nişîve wê xebatê de jî, gelek bûyer çê bûne ku wekî dîroka derbasbûyî hinek ji wan bûyeran erênî û hinek jî nerênî bûne.

Wekî şaşiyên taktîkî, şaşî di diyarîkirina hêla siyasî, şaşî di peywendiya digel aliyên dinê wekî hizb û girûp û heta dewletan, berçavgirtina berjewendiya girûpî û piştguhxiştina berjewendiya giştî, dûrkevtin ji wan hêl û pirensîpên ku tu li ser hatî çêkirin, jibîrkirina armanca sereke ya xebatê, şaşiya stratêjîk û dûrkevtin ji wan dirûşman ku karîbûn xelkê li dora te kom bikin.

Belê ew şaşiyên serve ku îşare pê hatine kirin, renge ji aliyê gelek hêz û aliyên siyasî û tevgerên şorişvanî yên Kurdistanê ve li her çar perçên Kurdistanê hatibine kirin ku bêguman zerer û xisar gihandine doza Kurd û bûye sedemê dilsarî û dûrkevtina xelkê ji wan part û aliyan.

Ger ev şaşî bi sedema bê ezimûnî û ne zanabûnê ve hatibine kirin, bêguman dikarin bo wan aliyan bibine ders da ku bi xwe ve biçin û wan şaşiyan dubare nekin û berpirsayetiya xisragihandin bi sedema şaşiya xwe bi doza Kurd jî, divê qebûl bikin, ku ew qebû kirina vejîn û zindîbûn û xweçêkirin û pêşkevtin û bidestveanîna baweriya gel e.

Lê berevajî dikare pêgeha wê part û aliyê lawaztir bike û hemî kes bizane ku ev ne şaşî bûne, belkî bi zanebûn li cehda xisargihandin bi doza Kurd e û hebûna hêz û aliyekî wisa tenê bi zerera doza Kurd e û bi qazancê dujminan e û mana wê tu xizmetekê nake.

Ewa ye ku em dikarin bêjin bûyerên dîrokî û şaşiyên di nava xebatê de dikarin bo me bibine ders û em jê fêr bin da ku carek din şaşiyan nekin.

Dîroka derbasbûyî dikare bibe neynûka pêşerojeke baş.

# Grîngiya parastina zimanê dayîkî



N: Dara Natiq

Di sala 1999'an de Organizasyona Perwerde, Ziman û Çand a Yekitiya Milletan (UNESCO), roja 21'ê Fabruaryê wek roja zimanê dayîkê ya navnetewî pejirandî ye. Armanca vê biryara UNESCO ew e ku pir zimanî û fireh rengî ya çand û zimanên cêwaz azad û geştir bin.
Êdî binpêkirina maf û azadiyan li welatên pêşketî wekî şermeke mezin tê dîtin. Lê belê ziman, ji ber ku ji bo gel û neteweyan mafê bingehîn e û tê wateya nasnameya gel û neteweyan, zext û qedexeyên li ser zimanê gelan, di heman demê de tê wateya înkar û tune hesibandina gelan jî.
Ji ber vê yekê, li welatê me de roja zimanê zikmakî ne roja pîrozbahiyê ye, roja têkoşînê ye.

Ev zilm û zordariyên li ser Kurd bi taybetî sedsala dawî de, peyva Kurdî jî kir peyvekî ''sîyasî'' ye. Di jiyana gelan de ziman xwediyê girîngiyeke gelemperî ya seranseriya dîrokê ye. Di hundirê zimanê gelekî de mirov dikare bi lêkolînî hemû serpêhatiyên wî gelî yên di tevahiya dîroka xwe de jiya ye lêbikole û bibîne.

Ziman xwe bi riya axaftinê û nivîsandinê derdixe der, lê cureyên xwebilêvkirina wê hene. Bi riya stranan, bi riya çîrokan, bi riya romanan, bi riya helbestan, bi riya şano, sînema û alavên ragihandinê, bi riya wêneyan û bi gelek cureyên din ziman dikare xwe bilêv bike anku derxîne der.

Ji awayê derketina der a ziman re, bi awayekî giştî mirov dikare bêje nirxên çandî yên gelekî; ji ber ku ziman hişkeber bi çandê ve wekî goşt û neynûkê girêdayî ye, her wiha çand jî bingehê xwe dispêre dîroka wî gelî.




Weke dizanin ku roja zimanê dayîkê bi coş û kelecan di hemû dinyayê de her sal di 21'ê Sibatê de tê pîrozkirin. Divê em Kurd, ji ber ku balê bikişînin ser girîngîya zimanê dayîkê pîrozbahîyên vê rojê xurt bikin. Di hemû qadên jîyanê de zimanê xwe bikarbînin û zindîtî û dewlemendîya zimanê xwe berdewam bikin. gotinek pêşînan heye dibêje "Kesên ku zimanê xwe winda bike, ew winda ye".

Zimanê ku meriv bi taybetî ji dayîka xwe ( û ji civaka ku tê de dijî ) dibîhîze û fêr dibe re « zimanê dayîkê » tê gotin û zimanê dayîkê kesayeta civakî ya mirovan diafirîne û xala herî pewist ya çêbûna netewan e. Netew jî bi hevkarî vê zimanê bikar tînin. Di dinyayê de her netewek bi zimanê xwe ( bi taybetî bi zimanê dayîkê ) tê nasîn. Netewe ji ber ku hebûna xwe bidomînin divê zimanê xweyê dayîkê biparêzin û di hemû qadên jîyanê de bikarbînin.

Ziman û netewe bi hev ve girêdayî ne û hebûn û tunebûna hevdu ne. Windabûna zimanan, windabûna civak, gel û netewan e.
Meriv çiqas zimanê xwe biparêze ewqas jî, hebûna xwe diparêze. Em çiqas rûmet û qîmetê bidin zimanê xwe ewqas jî didin xwe û netewê xwe. Dema ku ziman ji jîyana rojane û ji çandê, nivîsê û qadên zanistîyê derket mehkûmê mirinê dibe. Mîr Celadet Bedirxan : « Şerma mezin ewe ku mirov zimanê xwe nizanibe.

». Divê Kurd wextê bibêjin « Ez Kurdî nizanim. » fedî bikin û berê her tiştî zimanê xwe fêr bibin her wiha di mal û di nav malbatên xwe de bikar bînin û rûmet û qîmetê bidin zimanê xwe.

Netewe û civakên ku zimanê xwe neparêzin û rûmetê nedin zimanê xwe di binê bandora ziman, çand û hunerên din de dimînin û ji çand, huner û zimanên xwe ( û ji xwe ) dûr û bîyanî dikevin. Kesên ku ji zimanê xwe dûr bikeve ji çanda xwe, hebûn, kesayetî û nasnameya xwe jî dûr dikeve. Ji ber wê yekê bikaranîna ziman, hebûn û tunebûna netewaeyan e û xerca yekîtîyê ye. Di nava têgehên ku kesayeta neteweyan çê dikin de ya herî girîng « ziman » e. Divê em hemû Kurd li vê têgeh û nirxa herî pîroz û girîng xwedî derkevin û biparêzin ! An na em, di kîjan şert û mercê de û di kîjan erdnîgarîyê de bijîn, bi kesayata xwe ya netewî ango Kurd nayên hesibandin !
Gotina Celadet Alî Bedirxan ya ku li ser pêwistîya xwendin û nivîsandina zimanê me çiqas balkêş e : « Heyf xebînet û hezar mixabin nemaze ji wan ra ku bi zimanên din dizanin bixwînin û binivîsînin û alfabêya zimanê xwe hêç nas nakin. ». Ji bo zimanê me zindî bimîne divê em bixwînin, binivîsînin û di qadên muzîk, wêje û çandê de xebat û lêkolînan çê bikin ! Ji bo parastina kesayeta netewî çek û sîleha herî mezin axaftin û nivîsandina zimanê dayîkê ye.

Di qisedan û bikaranîna ziman de her tîpek dibe « kevirek » li nav çavên nijadperest û desthilatdaran dikeve ! Bikaranîn û nivîsandina zimanê dayîkê ji merivan re xîret û rûmet e. Divê meriv bêxîretî û bêrûmetîyê neke!

# Partiya Demokrat û girîngîdan bi pirsa jîngehê



**N: Bêhzad Qadirî**

**W: Hesen Mukerem**



Di pîwanek hûr de, jîngeh û çalakiyên peywendîdar dibe ku li qebareya komkirina zibilan li nav sirûştê an jî dermanlêdana canlibereke zirarlêdanê ketibe, bê sînordar kirin, kom çalakiyên ku nesaiyasî ne bi lidar xistina wan netenê metirsîdarin belkû, kareke xêrxwaziye jî! Kesên ku tenê di vê çarçoveyê de jîngehê dibînin û li ser vê yekê sorin ku, wan çalakiyên han bona hewleke sozdar û hestekê teng lidar bixînin.

Ev dîtingeha û ev reftarane, li malbenekê ku tevlî warê siyasî bûne û metirsiya canî hene, renge diyar be ku qeraxeke ewleh û aram bo komek ji jîngehparêzan çê bike. Lê, siyasetvan û berprisan vaksîne dike! Wan diparêze da ku reftarên bikaranînê û dije sirûştê yên xwe bi şiyaneke zêdetr berdewam bikin. Vaksîneya nesiyasî bi jîngehê binav bike û herwisa siyasetvan li hemberî daxwazkariyên teverên jîngehî de ewleh radigire.

Hebûna wezîr an serokê saziya jîngehê di kabîneya dewletê de, nîşaneya siyasîbûna pirsa jîngehê ye. Piraniya biryarên ku dewlet di warên weke, avedanî û vegeşînê de radigihîne, rasterast û nerasterast bandor li ser jîngehê heye. Herwisa ev dîtingehên han ku parastina jîngehê di çalakiyên encûmenan û komkirina ziblan li nav sirûştê sînordar dike û destê biryarderan bona wêrankirina jîngehê vekîtir dike û bi bê vê yekê ku bandorên wêranker yên pirojeyan di sirûştê de micid werbigrin. Berdewamkirina bi rê ve birina pirojeyên wêranker û sûd vergirtina nebicî a ji sirûştê di dem dirêjê de, mijarê di xuyabûna siyasî bo xuyabûna ewlehiyê vediguhaze. Li Îranê ev bûyera rû daye. Ji aliyekî ve ev heyama çendîn salane ku pirsa avê beşa herî girîng a jîngehêye û bûye mijareke ewlehî. Birde birda vê behsê 12 salan berî niha dihat bihîstin! Şêvra Bilind a Ewlehiyê ya rejîma Îslamî a Îranê vê demê hewl da ku, nerizayetiyên cotyarên bajarê Îsfehanê bi kêmitrîn nirxekê kip bike. Piştî vê jî bo çendîn caran, ewlehîbûna pirsa avê hate gorê lê, hejmarek ji medyayan, guh nedan bi vê mijarê û bê dengî hilbijartin. Niha ku behsa bê aviyê bûye kirîzeke micid û her ev medyane li ser vê yekê sorin da ku, agahiyên têkderane yên Şêvira Bilind a Ewlehiya Neteweyî a rejîmê yên derheq avê belav bikin û bikin bi medyayî.

Herwisa ji aliyekî din ve, siyaseta rejîma Îslamî a Îranê ya derheq Kurdistanê, siyaseteke koloniyalîstiye. Kurdistan xakeke ku hatiye dagîrkirin û rejîma Îslamî a Îranê jî, bi hemû şêwazekî hewla ji navbirin û talankirina wê dide. Herwisa rejîma Îslamî a Îranê, karên han bi hêzên leşkerî û serkutkirinê yên xwe birê ve dibe û li hemer de xelkê Kurdistanê bi destên vala mane, virda ye ku bi sedema hebûna peywendiya jîngeh û siyaset û herwisa têkdanên aliyên leşkerî yên rejîma Îslamî a Îranê, rola partiyên siyasî yên Kurdistanê, bitaybet Partiya Demokrat, weke xwedî û parêzgarîkirin ji xaka Kurdistanê ku hemen jînigeha Kurdistanê ye, zeq dibîne.

Her di destpêka avakirina Partiya Demokrat û Komara Kurdistanê de, girîngîdan bi xak, cografiya û jîngeha Kurdistanê, weke siytasetên herî girîng yên vê saziya siyasî hatine hesbandin. Xebata Partiya Demokrat li dijî dagîrkarî û li dijî talankirina samana sirûştî ya nîştimana Kurdistanê ye ku, ji aliyê dagîrkeran ve birê ve diçe û ev nîşana vê rastiyê ye. Û herwisa Piştî hilûşana Komara Kurdistanê û dubare serhildana tevgera neteweyî û Demokratîk li Kurdistanê bi rêberiya Dr. "Qasmlû yê nemir", pirsa parastina jîngeh, nek di vê çarçoveya niha de, belkû zeqtir bû.

Partiya Demokrat ku weke partiyeke neteweyî û nasyonalîst hatiye naskirin, berjevendiyên neteweyî û nîştimanî li pêş her berjevendiyekê de dadinê. Wate Partyia Demokrat digel siyasetên xwe, li xizmeta netewe û nîştimanê de ye. Partiya Demokrat her di destpêka avakirinê heta niha, bo vê xak û nîştimanê hezaran şehîd pêşkêş kiriye û herwisa selmandiye ku, nîştiman hêla sor a vê ye û heta gihîştin bi armancên bilind dev ji xebatê ber nade. Lê, nîştiman bi çi wateyekê ye û xwedî derketin û parastina nîştimanê çi tiştekê ji xwe digire û nîştimanhezî yanî çi?

Nîştimana me wate Kurdistan, tev vê cografiyayê jixwe digire ku, bi dirêjahiya dîroka xaka Kurdan hebûye û Kurd di nav de jiyane. Xwediyê wê cografiyayê Kurd in û xwedî derketin û parastina vê jî, li stûyê Kurda ne. Her tiştek, ji komek tiştên piçûk çê bûye ku, her yek ji wan di cihê xwe de, rola taybet bi xwe dilîze û girîngiyeke taybet bixwe heye, li laşê mirov û canliberan bigire heta ku topa erdê. Niha bo mînak çawan dibe em hez jixwe bikin. Lê, eger em ji çav, pêy û guhên xwe hez nekin?! Nîştiman jî her bi vî awayî ye. Nîştiman ji komek tiştên piçûk çê bûye û emê Kurd keyf ji wan tiştên piçûk neyê, keyf ji nîştimana xwe re jî nayê.

Bi wateyek din, nîştiman li çiya, av, heva, xelk, canliber, daristan, mozîk, kultûr, ziman û … hwd çê bûye, ku her yek ji wan di cihê xwe de, taybetmendiyek heye û renge zêdetr digel tiştên hevşêweyî vê di nîştimana keseke din de cuda be. Herwisa di vê dêkomentê de, beşa jîngehê cuda dikin ku çiya, av, canliber, daristan û … hwd jixwe digire. Pêşmergeyên Partiya Demokrat ku li kesên nîştimanî û neteweyîn, ji nîştimana xwe hez dikin, wate jîngeha xwe hez dikin û her çawan ku xwe weke parêzerên welat bi nav dikin wusa jî, parêzerên welatê xwe ne. Her bi vê sedemê ye ku pêşmergeyên Partiya Demokrat, di her beş û organeke Hizibê de mejûlî bi rê ve birina karûbarên hizbî û rêkxirava xwe dibin û mijarên han netenê ku liber cavin belkû ji wan re hatine binecihkirin.

Tevî vê ku rejîma dagîrker a Îslamîa Îranê, her di destpêka talankirina şoreşa gelên Îranê heta niha bi awayek berdewam li ti tawaneke nemirovane xwe bê par nekiriye û her niha jî, roj lipey rojê tawanên xwe zêde dike, bitaybet di Kurdistanê de. Di heyama salên derbazbûyî de, bi awayê berdewam tawan û pîlanên dije mirov yên xwe ji rêya Kurdên nefis nizim, xwefiroş û kirêgirtî ve zêde kirine û herwisa li rêya leşkerî û agirberdanê hewla kavilkirin û jinavbirina serçaveyên cuda ên li Kurdistanê daye û dide.

Berê û di vê serdemê de ku, şer û pevçûnên dinavbera Hêza Pêşmergê Kurdistanê û hêzên rejîmê berdewam bûye, rejîm tevî topbarankirina kor korane ya daristanan, valakirina betonê di nav kaniyên li çiyayên mezin

»»» Dom R:6

»»» Doma R:5

yên Kurdistanê de, bona ku pêşmerge şiyana sûd vergirtinê jê tunebin. Xelkê Kurdistanê bitaybet yên nişteciyên gundan, sedan mînak ji kiryarên qirêj ên rejîmê ji bîr û hizira wan de ye.

Di vê rewşa niha de, rejîm li rêya hêzên serkutkirin yên xwe û bitaybet Spaha Pasdarana terorsît, bilî vê ku tev saman û serçaveyên Kurdistanê talan dike, pîlanên weke talan û kavilkirin, wêrankirina sirûşt, jîngeh û darsitanên Zagirosê, di rêza bernameyên wan dene, heta li erdê cotiyarî baxçeyên xelkê zehmetkêş yên Kurdistanê jî destparêziyê nak in û bi hinceta hebûna Hêza Pêşmergê Kurdistanê û herwisa hin hincetên din, bi lidar xistina manhorên şanoyî û bi tûjkirina xwefiroşan, darên daristnên Zagirosê dibirin û bo parzêgeh û bajarên di bin desthilatdariya xwe de vediguhasin û piştire jî, agir ber dibin bi daristan, jîngeh û sirûşta navçeyên Kurdistanê. Gelek caran jî erdê çandinî û baxçeyên xelkê Kurdistanê jî kirine goriyê wan pîlanên qirêj yên xwe.

Partyia Demokrat ti carî li hemberî wan tawanên han bêdeng nebûye û tevî liqavdana tawanên rejîma Îranê, hertim hewl daye dengê jîngehparêzan bigihîne li seranserê cîhanê û hertim xwe weke piştevanê netenê jîngehparêzan belkû, tev çalakvanên Kurd û xelkê Kurdistanê zaniye.

Niha ku pirsa jîngeh û parastaina jîngehê weke girîngitrîn mijarên welatên cîhan, dewlet û rêkxiravane, Partiya Demokrat jî hewl daye bi girtina ber xwe siyaset û metodên nû, da ku ji wan rêkxiravan be ku girîngiyeke taybet didin li warê jîngehê. Partiya Demokrat weke partiyeke moderin û serdemiyane, ji her babetekê ku li berjevendiya xak û neteweya Kurd de ye girîngiyê pê dide û wusa dihesibîne ku bi baldan bi felsefeya hebûna vê hizbê, zêdetir ji her hizib û aliyeke din yên rojhilatê, erka parastina jîngehê li stûyê vê ye û her di vê herdeqê de jî, çalakiyên di warê medyayî û perwerdehî ên xwe berfireh dike.

# Tupogirafiya Kurdistanê

N: Rojnameya Agirî

Tupogirafiya her welatekê li fekitorên hûndir û derve pêk tê. Peydabûna çiyayan bo wan mazeyên erdê vedigerin bo wan tokilên ji erdê çê dibin. Herwisa piraniya deştan jî li serobin bûnên zêde yên erdê peyda dibin ku, di dawiyê de bi pêkihateyên rûniştî yên weke rûbar û dolan tijî bûye.

Tupogirafiyaya Kurdistanê di warê bilindahî û nizmahiyê de, li navçeyekê bo navçeyeke din cudahî heye. Navçeyên weke Bakur û Rojhilat, li çiyayên bilind hatiye peçatin ku, bilindahiya hinek ji wan Çar hezar metran zêdetre. Di nav wan çiyayan de çend panahiyên deştan hene . Navçeya Başur û Rojavayê nizimin û vir çiya kêm in û zêdetir ji panahiyê pêk hatiye. Herwisa di navbera wan du diyardeyên xwezayî de, hejmarek girêk jî hene.

Tupografiya Kurdistanê li nîvê zêdetir ji çiyayan pêk hatiye. Ev çiyayane di encama hereketeke gelek bihêz a hûndr û derve ku bi hereketa Alpê hatiye naskirin çê bûne. Ev hereketa di dawiya çerxa “Ulogisîn”ê û bi dirêjahiya çerxa “Mêyusîn” û heta destpêka çerxa “Bilêosîn”ê bi awayekî gelek tund bûye û givaş xistiye li ser qadên nerim yên di bin deryaya “Tîs”ê de.
Heta niha raberiya hereketa serhildana çiyayan bi awayekî baş û kêrhatî nehatiye zanîn. Bi baweriya hinek zanayan, raberiya çiyayan ji aliyê Bakur bo eniya Başur bûye, wate li girên Îranê ber bi aliyê Mezipotamiya destpê kiriye. Hinek kes jî li ser vê baweriyê ne ku, li Başur ber bi aliyê Bakur ve bûye.

Piştî serhildana çiyayan li Kurdistanê ji aliyê wan baranbarînên ku, li çiyayan ber bi aliyê xwarê ve hatine, hereketeke rûtirineke gelek tund û dijwar destpê kiriye. Wan avan hûr kevir, kevir, xîz û lîm digel xwe vemalîn û ber bi aliyê cihên nizim ve anîn û vir bicih hêlan.

Gevşînên çiyayên Kurdistanê
Rûyê piraniya çiyayan li Bakur û Rojavayê, ber bi aliyê Başur û Rojhilat in. Tenê hejmareke kêm nebin ku li vê yasayê derdikevin û raberiya wan ji Rojhilat ve ber bi aliyê Rojavayê ne, an berevajî. Çimkû li Rojhilat girên hişk ên Îranê hene û li Rojava jî nîmiçe giravên erebî hene ku, bi hemen awayî hişk in. Herçiqas jî hereketa hûndir bihêz be dîsan şiyana hebûna bandorê li ser wan herdu girên hişk nabe da ku bikare hereketa çiyayan biguhere.
Çiyayên Kurdistanê ji bilindahiya bi qasî 500 metran asta deryayê destpê dike û hêdî hêdî zêde dikin heta digihîjin bi 5 hezar metran. Di vê derheqê de kêm navçeyên din hene ku li Başur û Rojavayê Rojhilata Navîn de bilindahiya wan bigihîje asta yên Kurdsitanê.
Ji ber tundbûna hereketa hûndir, qadên çiyayan gelek aloz in. her ev yek jî bûye sedema têkdana yek lipey yek a qadên erdê. Ji ber çerxa cêhlojîkê di hinek cihên çiyayan de, qata çerxa herî dîrokî li asta herî bilindi ne. Her li hemen demê de qadên çerxa nû ketine binî.

gupika çiyayan gelek bilind û tebeqên çiyayan jî gelek serobin in. Û herwisa li hinek cihan de jî, gelek li yektir nêzîk hildikevin û dolên gelek kûr pêk anîne ku, kûrahiya hinekan ji sedan metran zêdetir dibe.

Piroseya rûtbûna erdê ji çiyayan gelek bi tundî rûyî da, sedema vê vedigere bo barîna berf û baranên zêde, çimkû di wan deman de carê çiyayan bi awayekî tewav xwe negirtine.

Heta niha hejmara tev çiyayên Kurdistanê bi tevahî nehatine zanîn û dirêjahiya çiyayan rengê yektir nadin. Li Kurdistanê çiyayên wusa hene ku bilindahiya wan ji 5 hezar metran zêdetir e. Herwisa hinek çiyayên din jî vir hene ku asta bilindahiya wan ji hezar metrî kêmtire.

Çiyayên herî bilind yên Kurdsitanê ên ku li 4 hezar metran bilintirin wuha ne: “Çiyayê Agirî yê mezin, çiyayê Dîna, çiyayê Zerde Kêv, Kûtkeya Reşo, Cîlo, Sîpan û Oştiran Kêv û … hwd”.
Çiyayên ku bilindahiya wan di navbera 3 heta 4 hezar metranin bi wî awayî ne: “Çiyayê Agiriya piçûk, çiyayî Mor, Çiyayê Qeredax, Çiyayê Başteq, Çiyayê Tendurek, Çiyayê Gerîn, Çiyayê Sumbul, Çiyayê Helgurd, Çiyayê Şaho, Çiyayê Qendîl û … hwd”.

“Çiyayên navincî ku bilindahiya wan 2 heta 3 hezar metranin bi wî awayî ne: Çiyayê Ayîdin, Çiyayê Şevanit, çiyayê Piyaze, çiyayê Çutele, çiyayê Kumana Hasan, çiyayê Kawakî, çiyayê Ziyaret, çiyayê Şeq Şeq, çiyayê Kebîr, çiyayê Kune Kutir, çiyayê Pîremegirûn, çiyayê Karox, çiyayê Manişt û … hwd”.

Herwisa çiyayên nizim ku bilindahiya wan di navbera 1 heta 2 hezar metran e wiha ne: “Çiyayê Qerece, çiyayê Zozig’ çiyayê Bemo, çiyayê Dalaho, çiyayê Kêvdar, çiyayê Ezimere, çiyayê Qereqaş, çiyayê Raman û … hwd”.

Çiyayên herî nizim ku bilindahiya wan ji hezar metran kêmtire jî, bi wî awayî ne: “Çiyayê Levend’ çiyayê Qasiluce, çiyayê Yanarsu, çiyayê Sûsû, çiyayê Teqteq, çiyayê Zîrzerdî û … hwd”.

## Nerîna Lîderan



**“Chuck Fleischmann”:**

Her rêkkevtinek digel rejîma Îranê bê kirin divê Sena biriyarê li ser bide




**“Sergey Lavrov”:**

Ya rojava dike ne dîplomasî ye



**“Naftali Bennett”:**

Lihevkirina digel Îranê şaştiyeke stratîjîke



**“Joe Biden”:**

Putîn biryara êrîşîkirina li ser Ukrayînê standiye

# Ji bo Kurdan hertim roja zimanê dayikê ye



N: Eskender Ceiferî

Kurd li her perçeyek Kurdistanê bi awayekî di bin zulmê de ye. Li Rojhilat, mînaka herî ber biçav, girtina Zara Mihemedî û mamosteyên din ên zimanê Kurdî ye.

Roja 21’ê Şibatê ji aliyê Neteweyên Yekbûyî (NY) ve weke “Roja Cîhanî a Zimanê Dayikê” hatiye erêkirin û pejirandin û di sala 1999´an de ji aliyê UNESCO’yê ve hat erêkirin.

Ew roj, di encama xwepêşandinekê de hate destnîşankirin ku li Pakistanê ji bo zimanê dayikê ji aliyê ciwanên xwendevan ve hatibû encamdan û di xwepêşandanê de çend ciwan jî hatibûbûne kuştin.

Lê ne tenê ev roj, lê belê hertim ji bo Kurdan roja zimanê dayikê ye. Ev sedan sal in ku Kurd ji mafê xwendin û nivîsandin bi zimanê xwe bêpar in, ew têne koçberkirin jî, lê dîsa jî zimanê xwe wenda nakin.

Kurdên Xurasanê ku di 3ê qonaxan de ji zêdetirî 500 salan beriya niha ve ji Kurdistanê ji bo wir hatine koçberkirin, mînakeke herî başe ku nîşan dide Kurd ji zimanê xwe xwedî derdikevin. Ew hertim rastî hewlên asîmîlekirinê weke qirkirinên siyasî û çandî û zimanî hatine lê, dîsa jî ziman û çanda xwe parastine.

Herî dawî ew ji beşdarî di şeşemîn festîvala bîranîna Elîşah Xan Heyderîzade helbestvanê Kurd de bêpar bûn. Di festîvalê de nivîskarên Kurd ji Hemedan, Loristan, Ormiye, Sine, Kirmaşan û Îlamê beşdar bibûn.

Ev rêgirtin, binpêkariya yasayên maf û azadiyan e ku li gora wan, her kes bêyî ku ji ber ziman, ol, baweriya siyasî yan jî yeke din jêbûna neteweyî û yan jî civakî, mal, zayîn an jî rewşeke din bibe, xwedî sûdwerigirtina ji hemû maf û azadiyan.

Ew piranî ji herêmên bakurê Kurdistana Rojhilat in. Her ji dema desthilata Manayan ve di sedsala 9’an a beriya zayînê ve ew li Kurdistanê xwedî bandor bûn. Di dema çêbûna Împeratoriya Medan de rengê cudahiyên li navçeyê û dîsa jî tevlîbûna hêzan derdikeve ku Kurdên Kurmanc jî yek ji wan in.

Dem derbas bû û desthilat bû ya Şî`eyan. Di salên derdora 1590’an a Zayînê de hewla koçberkirina Kurdan ji Urmiye, Xoy, Makû û Selmasê ji bo Xurasanê dihat dayîn. Ew di salên di navbera 1598’an de heya 1602’an ên Zayînê ji bo Bakurê Xurasanê hatin koçberkirin da ku welatê Farsan biparêzin. Ew koçberkirin di encama civînekê de hat ku di navbera Şah Ebbasê Sefewî û mezinên Kurdan re hate lidarxistin û serokhozên Kurd bi Sefewiyan re li ser koçberkirina wan lihev hatin. Beriya wê di şerê Çaldiranê de ku di sala 1514’an de çê bû, Kurdistan bibû du perçe. Di hemberî koçberiyê de hatibû misogergirin ku wê mafê wan li Xurasanê parastî be.

Ev cara yekemîn nîn e ku astengî li hemberî çalakiyên Kurdên Xurasanê çê dibin. Beriya niha jî, wezareta Çanda Îslamî ya Îranê, rê nedabû festîvaleke Kurdên wê navçeyê bê lidarxistin. Festîvala Pîran Çengî ku her sal li bajarê Qoçanê li Bakurê Xurasanê birêve diçû û tê de hunermendên Kurd ên vê herêmê û bi taybetî kesatiyên naskirî ên mûzîka kevn a vê herêmê beşdar dibûn, sala serbasbûyî pêşî lê hate girtin û îzna birêveçûnê jê re nehat dayîn. Ev di demekê de bû ku ji bo wê festîvalê ji aliyê Kurdên wê herêmê ve xerceke zêde hatibû mezaxtin.

Ev kiryar jî hemû bingehên Danezana Gerdûnî ya Mafên Mirovan binpê dike ku li gor wê, mafê çalakiyên welatiyan bêyî liberçavgirtina sîstema dadwerî yan sedemên din ên weke qewmiyet, netewe, dîn yan bawerî, heye. Lê ne sorgonrkirinê û ne jî bêparkirina wan ji van çalakiyan, nekariye û nikare zimanê wan jinav bibe.

Weke ku çawan Mihemed Neqî Lutfî nûnerê Elî Xaminêyî li parêzgeha Îlamê ya Kurdistana Rojhilat û pêşnimêjê bajêr dibêje, nabe zimanê Kurdî û nivîsa Kurdî li Îlamê hebe û divê pêşiya wê yekê were girtin, li Xurasanê jî heman rewş heye. Cîgirê parêzgarê Xurasana Bakurî di civînekê de ragihandibû ku dijberên Komara Îslamî dixwazin hesta nasyonalîstî angu hesta netewî di nav xelkê vê parêzgehê de çê bikin. Wî berpirsê bilind ê Îranî ji saziyên ewlehî xwastibû ji bo bêbandorkirina partiyên Kurdî li wir tevbigerin. Gotinên bi wî rengî hertim rastî nerazîbûna çalakvanan tên lê, di hember de cihê wan çalakvanan dibe girtîgeh. Ev dujmin, baş dizane ku ziman, hebûna me ye.

Komara Îslamî ya Îranê bi van kiryarên xwe, benda yekem a Danezana Gerdûnî a Mafên Mirovan bi bêparkirina xelkê ji azadiyan binpê dike. Ji ber ku standina mafê çalakiyên zimanî û çandî jî, beşek ji binpêkirina azadiyê ye. Herwisa benda duyem jî ku amaje dike ji ber statuya siyasî, hiqûqî an jî, ya navneteweyî di navbera mirovan de cudahyî nayê kirin û welatî li cem dewletan divê wehkev bin, binpê dike. Çimkî li vir maf, tenê ê neteweya serdest e û neteweyên weke Kurd, Ereb, Azerî û Belûçan ji her çalakiyeke wêjeyî, zinanî û çandî bêpar in.

# Encûmena Nîştimanî ya Kurdî û rola amadenebûyî



N:Sabri Rasoul

Min ji berî niha, sergotarek bi vî rengî bi zimanê Erebî di servivîsa rojnameya Kurdistan hejmar 554 de belav kiribû, naveroka wê nivîsê li gorî bûyerên wê demê nêzîkî naveroka vê gotarê ye, girîng e em carek din rawestin li ser rola ENKS di qonaxeke herî hestiyar û metirsîdar ji qonaxên dîroka gelê Kurd de.

Her ji destpêka damezirandina Encûmena Nîştimanî ya Kurdî ve, wê girîngiyeke taybet ya herêmê û navdewletî bi xwe ve stand, nemaze piştî beşdarbûna mezin ya xelkê di destpêka şoreşa Sûriyê de, ku gelê kurd gelek hêviyên xwe li ser vê çarçoveya siyasî girêdan, ji ber ku ew hilgirê projeya neteweyî ya kurdî li Kurdistana Sûriyê bû, û têde ji aliyê rêxistinê ve gelek partî, komeleyên jin û lawan û kesayetiyên serbixwe cihê xwe digirtin ku bi giştî nûnertiya gelê kurd dikirin.

Dîsa ji destpêka damezrandina xwe ve, piraniya hêzên Kurdî, yên siyasî û çi civakî li dora Encûmena Niştimanî ya Kurdî kom bûn, ku rola siyasî xiste stûyê xwe di yek ji metirsîtirîn qonaxên têkoşîna siyasî dihat dîtin ji ber nezelaliya rewşa nû û paşeroja Sûriyayê, ku ENKS'ê bi wê giraniya civakî û siyasî, cihê xwe di nav civînên herêmî û navdewletî de girt.

Encûmen bi dijwarî rastî zehmetiyên mezin hat ku hebûna wê ya siyasî hem li hundir hem li derve hat armanc kirin, ku Rejîmê hêza xwe ya îstixbaratî û ya hevkarê xwe bikar anî ji bo lêdan û lawazkirina rola EKNK'ê peydakirina ternatîvên girêdayî siyaseta rejîmê, ji aliyekî din ve PYD'ê li dijî daxwazên gelê kurd derket bi rêya binpêkirina herdu peymanên Hewler û Dihokê yên bi Encûmena Nîştimanî re, û bikaranîna tundûtûjiya siyasî û leşkerî ji bo ferzkirina serweriya xwe bi awayekî hovane û tund, hevdem ku (ENK-S) karî bedewamiya xwe bi piştevaniya girseyî ya cemawerê gelê Kurd û bi piştgiriya Serokatiya Herêma Kurdistana Iraqê û Hikûmeta wê tekez bikî.

Encûmena Niştimanî ya Kurdî roleke sereke di yekxistina opozisyona Sûriyê de lîst, tevî hizra şovenîst ya hin rêberên opozisyonê ya nêzîkî helwesta rêjîmê derbarê çareserkirina pirsa kurdî li Sûriyê, tevî ku çareseriya siyasî ji doza kurdî re, wê bi carekî di çarçoveya çareseriyeke berfireh û serûbinkirina rûpela stemkariyê de be, û avakirina Sûriyeke piralî û federal, dewletek têde yasa serwer be bi şirîkatiya hemû pêkhateyên wê yên netewî û olî.

Lê ENKS'ê heta niha jî di warê siyasî û medyayî di heman sistiyê de rola xwe derbas dike, heta em dikarin bêjin ku ew qebarek siyasî yê bê ziman e, malpera wê heta radeyekî mezin kêm babet e û hîç rojnameyek yan zimanhalek nîne, ku ji sala 2015'an ve û heta niha alîgirên xwe jidest dide û rola wê hêdî hêdî paşde diçe, herweha sist û qelsî heye di karê wê û encûmenên wê yên xwecihî de, yên li welêt û derve de, û rola wê lawaz dimîne ji ber kotayên hizbî yên ku hin ji kesên bêkêr digihînin hin saziyên girîng.

Encûmen dikare bibe lîstikvanek jêhatî ji bo pirojeya netewî ya kurdî bi rêya bikaranîna hebûna xwe di civînên herêmî û navdewletî de, bi bikaranîna têkiliyên xwe yên dîplomatîk li gel hêzên erebî, herêmî û navdewletî re, û bidestxistina dostaniya hêzên mezin yên xwidan bandoreke rasterast li ser pirsa Sûriyê.

Heger ENKS'ê bikaribe kar û xebata xwe ya medyayî û siyasî pêş bixe, dê bibe hêzek bi bandor bi rêya bihêzkirina têkiliyên xwe bi cemawerê xwe re û baweriya xelkê xwe careke din bi xwe vegerîne, bi avakirina saziyên ragihandinê yên bikarin dengê gelê kurd û êş û azarên wê bigihînin gel û cîhanê, ji ber ku ew nûnerê resen yê gelê kurd li Sûriyê ye, zêdebarî binbirkirina gendeliya ketî di nav wê de, ew gendeliya hatî li ser destên wan hêzên ku herêmê birêve dibin û di nav civakê de belav dikin, ku ew genedelî di nav Encûmenê de belav bûye û bêhn pêketî ye.


Bidestxistina mafên vê qonaxê pêwîstî bi xebateke zêdetir heye, nemaze bi xebatekî heye ji bo balê bikişîne li ser pirsa gelê Kurd wekî pirseke nîştimanî ya pêdivî bi çareseriyek bilez heye, ku nabe bi paş bikeve, herwiha ku hêza Encûmenê di şiyana wê de ne ya li ser bidestxistina faktorên hêza siyasî û cemawerî, ne li ser sloganan û rengê wê beriqandî.

# Evên ku ji wan re dibêjin “regeza sêyem” her weke me mirov in



N: Vênus Fayeq

W: Hesen Mukerem



Bitaybet em xelkê Rojihlata Navîn li rewşeke wusa civakî, perwerdehî û exlaqî de nehatine perwerdekirin da ku bi hêsanî li derheq mijarek weke “regeza sêyem” nîqaşan pêk bînin. Herçend ku ez bixwe li dijî bikaranîna vê kategoriya peyvê me çimkû, her ev yeka careke din û bi awayekî din cudakirina wan li mirovên asayî ye, û wan tûşî rewşeke derûnî ya dijwar dike.

Lê, di dawiyê de, çawan em li hemberî tawana kuştina mirovekî asayî dengê xwe bilind dikin, niha dema vê yekê jî hatiye ku, li hember tawaneke wuha nefretî weke kuştina mirovekî ku, tenê ji ber vê, ev ji aliyê hormonî ve pirsigirêk hebe û weke kur jidayîk bûye lê, weke diyar, deng û reftaran weke keçikan nîşan dide yan jî berevajî, ev yek ji mirovan re ti mafekî nade da ku dawiyê bi jiyana mirovên wuha bînin.

Regeza sêyem, ji wan mirovan re tê gotin ku di dema jidayîkbûnê de, bi sedema hebûna pirsgirêkek hormonî, regeza wan corek ne cihgîrî li hûndir de heye. Bo mînak nêr jidayîk dibin lê, ji gelek aliyan ve pirraniya reftar û kirdarên wan digel nêran cudahî heye, heta xelkên din ku wan dibînin îhsas dikin ku zelamekî tewav nîne. Pirraniya mirovên wuha rastî nixman, lataw û bêzarkirinê dibin. Di hemen demê de jî, komek din jî hene ku xwe hem weke kur û hem jî weke keçik dihesbînin. Mirovên wuha bi deng, kinc û şêwaza reftarên rojane ên xwe de tên naskirin ku ev jî, jidestê wan bixwe de nîne.

Mirovên wuha di nav civakên Rojhilat de, ev civakên ku, bi ol û kenveşopiyên civakî û eşîretî yên paremayî de ne, hatine mekumkirin, tûşî rewşên dijawr ên derûnî dibin û gelek caran jî, li derdorên xwe rastî arîşe û pirsgirêkên civakî dibin. Lê, tevî wan hemû arîşeyan, pêka pêwerên mirovî û zanistî, ev jî însanin û mafên wan pêka vê rewşa ku hene nayên guhertin. Îşkencekirina wan ji aliyê derûnî û fîzîkî ve tawan e, û çi bigihîje vê ku hewla kuştina wan bê dan.

Ez li warê zanistî de taybetmend nînin lê, ji aliyê yasayî, exlaqî û însanî ve dikarim bêjim tu kesî mafê vê yekê nîne ku, dinavbera wan de cudahiyê danê, yan wan îşkence bike yan bêzar û herasan bike, heta kuştina wan jî her weke tawanekê ye digel kuştin kesekî asayî û ti cudahiyek di vê navberê de tune ye.

Ademîzad bi sirûşt canlibereke ku, şiyana xwe guncandinê heye, û herwisa şiyana têgihîştin, hûrkarî, vekolîn û şirovekirinê heye. Lê, pirsigrêka herî mezin di vê yekê de ye ku, hinek kes bi awayekî hatine daşkilandin, heta heya wan li zanist û sirûştê jî tuneye û li serweyî exlaq, vêjdan û yasayê, biryarên pêşveqt didin û amade nînin, guh ji kesekê re rabigritn da ku bizanin pirsgirek û arîşeyên wî/ê çine.

Eva karesat e, biryara bidawî anîna jiyana kesekî bisitînî, tenê bi sedema vê ku bi şêwazeke cuda li xelkê asayî hatiye afirandin. Nabe bi gotinên hilgirê hizira tundrew ya olî dest bixînî li nav karê xwedê de. Ez pirsyar dikim, tu bêjî xweda çi cezayekî ji bikujê kesekê re bide, ku tenê tawana wî/ê ev ye ku di hormonên wî/ê de kêmasî hene, bi şêwazekî hatiye dinê ku bi sedema ne cihgîrbûn û aloziyek di nav hormonên wî de, jiyanek asayî derbas nake. Lê, zanistê ev şiyana heye ku vê arîşeya wan çareser bike da ku, ev jî bibin xwediyê vê regeza ku pê asûde dibin.
Ev jî ,ademîzadin û tu cudahiyek digel ademîzadên din tunînin, weke tev ademîzadên asayî hêjayî rêzgirtin û lê têgihîştinê ne û herwisa hewcehî bi piştevanîkirin û himbêzkirinê ne.

Parastina mirovên wuha hewcehî bi yasayek taybet nîne, tenê li welateke paremayî de, belkû, hewcehî bi hişyariyek baş û hûr li warê mafên mirovan de heye. Çimkû tev paybendbûnên yasayî yên welatan yên li derheq mafê mirovan de, li yasaya navdewletî de li ser bingeha carnameya cîhanî a mafê mirov û lihevkirinên navdewletî yên li derheq mafê mirov de, bi awayek hûr ev xalane hatine zelal kirin.

Her ev maye ku bêjim, li derdora me gelek nehezî û nefretên zêde hene ku hewla çareserkirina wan bidin, bi cihê vê ku jiyana hin kesên din bixînin metirsiyê de ku, ti zirareke wan bo derdorê tune ye, û tenê hewcehiya wan bi derdorekê heye, ji wan fêm bikin û piştevaniya wan bikin, û mia`mileyek kêrhatî digel wan encam bidin.


# Roger Waters bo hunermenda Kurd bang li Erdogan kir

**Endamê grûbeke navdar a muzîkê ya Brîtanî Roger Waters derbarê hunermenda Kurd Nudem Durak ku ev zêdeyî 6 sal in di girtîhgehê de ye peyamek belav kir û ji bo azadkirina wê bang li Serokkomarê Tirkiyê Recep Tayip Erdogan kir.**

Hunermend Nudem Durak ku ji navçeya Dêrgulê ser bi parêzgeha Şirnexê ya Bakurê Kurdistanê ye, di sala 2015ê de bi hinceta "endamtiya rêxistinê" hatiye girtin û 19 sal cezayê girtîgehê lê hatiye birîn.

Endamê grûba muzîkê ya Pink Floyd a Brîtanî Roger Waters li ser hesabê xwe yê medya civakî peyemek belav kir û ji bo azadkirina Nudem Durak ku ev zêdeyî 6 sal in di girtîgeh Tîpa M ya Bayburtê de girtî ye, bang li Serokkomarê Tikiyê Recep Tayîp Erdogan kir. Waters herwiha di peyama xwe de dibêje: "Em dê te azad bikin Nudem Durak."
Di girtîgehê de gîtara hunermenda Kurd Nudem Durak ji aliyê gardîyanan ve hatibû şikandin. Derbarê vê yekê de jî Waters di hevpevîneke xwe ya ligel kovarekê de ragihandibû ew dê gîtareke xwe ku di turneya 2017-2018ê de bikar aniye wek diyarî ji Durak re bişîne.

Roger Waters dibêje: "Wê (Nudem Durak) ji bilî fêrkirina gîtarê ya bo zarokan û nivîsîn û gotina



stranên xwe yên li welatê xwe ti tiştek din nekiriye."

Berî demekê jî Roger Waters ji bo azadkirina Nudem Durak kampanyayek dabû destpêkirin û hunermendên navdar ên wek Pete Townshend, Robert Plant, Peter Gabriel û Brian May piştgirî dabûn wê kampanyayê. Ç: RÛDAW

# Hemû berhemên Şikoyê Hesen çap bûn

**Hemû helbestên Şikoyê Hesen bi latînî ji Weşanxaneya Nûbiharê derketin. Navê pirtûkên Şikoyê Hesen wiha ne: Qalçîçek, Tembûrê Kurda, Meremê Dilê Kurd, Perweza Weten.**


Pirtûka Qalçîçek di sala 1961an de tê çapkirin û di 1965an de jî Tembûrê Kurda derdikeve. Meremê Dilê Kurd 1971an de çap dibe. Piştî mirina wî bi saleke din di 1977an de jî Perweza Weten tê çapkirin. Niha jî Weşanxaneya Nûbiharê hemû berhemên Şikoyê Hesen çap kirin.

Hin ji helbestên Şikoyê hesen wek stran hatine xwendin û di nav gel de belav bûne. "Zimanê Kurdî" ku cara pêşî ji hêla Aram Tîgran ve hatî xwendin helbesta wî ya herî zêde tê zanîn e.

Di rûpelên pêşî yên her çar pirtûkan de jî pêşgotina Eskerê Boyîk heye.

Omer Faruk Feyat ku hemû helbestên Şikoyê Hesen ji Kirîlî veguhestiye Latînî wiha dibêje: "Bi tu şiklî me orjînala helbestan xirab nekir, bi wan neleyîst. Peyvên bilêvkirina herêmî hatine nivîsîn qet nehatine xirabkirin."

Feyat, di berdewamiyê de der-




barê lêzêdekirinên di pirtûkan de wiha got: "Di çar pirtûkên Şikoyê Hesen de gelek helbest cih digirin. Hinek helbestên wî xweyî nav in, lê hinek helbestên wî jî bê nav bûn. Helbestên bê nav di metna orîjînal de bi şeklê "*" hatibûn binavkirin. Ji bo ku helbest hem zû bête dîtin hem jî bênav nebe, me navekî li helbestên bênav kir. Di helbestê de rêzika ewil çi be, me ewê wek nav hilbijart. Li rexê wê jî îşareta "*"danî. Bi vê îşaretê dê bê zanîn ku ev sernav ji hêla me ve hatiye danîn."

Hêjayê gotinê ye ku cara yekê ye hemû berhemên Şikoyê Hesen bi Latînî tên çapkirin.

JIYANA ŞIKOYÊ HESEN

Malbata Şikoyê Hesen dema Herba Cîhanê ya Ewilî ji gundê Şatiroxliya girêdayê Digora Qersê bar dikin û diçin gundê Camûşvana Biçûk ya li berpala çiyayê Elegezê ku niha di nav sînorê Ermenîstanê de ye.

Şikoyê Hesen di 5ê Hezîrana 1925an de li vî gundî tê dinê. Hê pênc salî tunebûye bavê wî Hesenê Mido diçe rehma Xwedê. Zarokatiya wî bi zor û zehmetî derbas dibe.

Sala 1948an ji pey qedandina mektebê ra diçe bajarê Yêrêvanê û li Zanîngeha Ermenistanê ya dewletê, beşa Zimannasiyê, Fakulteya Rojhilatzaniyê qebûl dibe.

Sala 1953an xwendina bilind bi serkeftî xilas dike. Wî dişînin gundê Baxnarê, nehiya Gagrayê /Abxaziya/ Komara Gurcistanê ku di dibistana wî gundî ya Ermeniya da wek dersdarê ziman û edebiyeta Ermenî bixebite.
Heta sala 1959an li wir dixebite. Lê xwestin û meremên wî berdewamkirina xwendinê, kurdzanî, edebiyet û zimanzaniya Kurdî bûn. Sala 1959an dema karên kurdewerî dîsa li Ermenistanê geş dibin, vedigere Yêrîvanê û Radyoyê, di para axaftinên bi zimanê Kurdî da wek werger û xebatkarê edebiyatê derbasî ser kar dibe.
Du sal şûnda êntiyaman dide û di aspîrantûra Akadêmiya Ermenistanê ya zaniyarî beşa zimanzaniyê da qebûl dibe. Dişînine Lênîngiradê ku li cem rojhilatzanên eyan li ser têza xwe ya doktoriyê bixebite.

Rûyê destengî û tunebûna mecalên jiyanê, nexweş dikeve doktoriyê nîvco dihêle û vedigere Yêrîvanê û di sektora Kurdzaniyê ya Akademiya Ermenistanê ya zanyariya pera rojhilatzaniyê da dixebite. Vira jî bext jê ra nakene, nikare pirsgrêkên mala xwe yên aborî çareser bike. Nivîsarên wî di wadeyê da naweşînin. Lawê biçûk di qezyakê da tê kuştin. Mecbûr mala xwe bar dike destguhestî bajarê Tilbîsê dibe. Destengî, nexweşî, bêgumanî lê zor dikin. Di 48 saliya xwe da, 22yê Çiriya Paşin/Mijdarê sala 1975an dawî li jiyana xwe tîne.
Berhevoka helbestên wî ya ewilîn: "Qalçîçek" sala 1961ê li Yêrêvanê hate weşandin. Berhevoka Şiko ya duda: "Tembûrê Kurda" sala 1965an hat weşandin. Sala 1971î berhevoka wî ya helbesta: "Meremê Dilê Kurd", lê sala 1977an, êdî salek ji pey wefeta wî ra berhevoka "Perweza Weten" çap bûn.
Ç:Kurdistan 24

# Binpêkariyên mafê mirovî di Kurdistanê de

## Kolberek Kurd bi sedema ravestana dil canê xwe jidest da

Roja Yekşemî 1`ê Reşehê, kolberê Kurd ê bi navê “Elî Dervêşanferd” xelkê bajarê Selasabawecanî, bi sedema ravestana dil, li ser sînorê Newsûdê canê xwe jidest da.

Ew kolberê Kurd şeva derbasbûyî bona kolberiyê çûbû sînorê Newsûdê, piştî hilgirtina barê giran li bin zexta sirr û barîna berf û baranê, li dema gihîştina cihê radestkirina barê xwe, dilê wî radiveste û cane xwe jidest dide.

Ew kolberê Kurd, nêzî 50 sal temen hebûye û termê wî bo pizîşkê yasayî ya bajarê Kirmaşanê hate veguhastin.

## Sehah Pizîşkî bi danîna barimteyê hate azadkirin

Îro Şemî 30`ê Rêbendanê, welatiyek Kurd ê bi navê “Selhah Pizîşkî” xelkê bajarê Baneyê bi danîna barimteyê ji girtîgeha navendî ya bajarê Sineyê hate azadkirin.

Ew welatiye bi danîna barimteya 200 milyon Tumenî bi awayek demkî heta bi dawîhatina heyama dadresiyê ji girtîgeha bajarê Sineyê hate azadkirin.

“Selah Pizîşkî” roja Duşemî 25`ê Rêbendanê piştî bi dawîhatina heyama lêpirsînê ji girtîgeha îdareya Îtila`ata bajarê Sineyê bo girtîgeha navendî ya wî bajarî hatibû veguhastin.

Ew welatiye di heyama binçavkirinê de ji “destpêragihîştin bi parêzer” û “hevdîtin digel malbata xwe” bêpar bû û hêzên ewlehî navbirî bi tohmeta “hevkarîkirin digel yek ji partiyên Kurdî yên dijberên hikûmeta Îranê” ceza dabûn.

Roja Pêncşemî 20`ê Xezelwerê, “Selah Pizîşkî” bi bê hebûna ti belgeyek yasayî bi lêdan û bêrêzî ji aliyê hêzên ewlehî ve hatibû binçavkirin û bo lêpirsînê bo girtîgeha îdareya Îtila`ata bajarê Sineyê hatibû veguhastin.

## Welatiyek Kurd ji aliyê hêzên ewlehî ve li bajarê Pîranşehrê hate binçavkirin

Roja Şemî 30`ê Rêbendanê, welatiyek Kurd ê bi navê “Luqman Seyde (Cola)” xelkê bajarê Pîranşehrê ji aliyê hêzên ewlehî ve hate binçavkirin. Hêzên ewlehî bi bê hebûna ti belgeyek yasayî êrîş kirine ser mala wî welatiyê û navbirî binçav kirine.

Ew welatiyê Kurd piştî binçavkirinê bo cihek nexuya hatiye veguhastin.

Heta dema belavbûna vê nûçeyê, ji sedema binçavkirin û tohmetên ku li dijî “Luqman Seyde (Cola)” hatinî sepandin ti zaniyariyek ber dest nîne.

## Kemal Ebasvend bo cîbicîkirina heyama girtîgeha xwe bo girtîgehê hate veguhastin

Di heyama çend rojên derbasbûyî de, welatiyek Kurd ê bi navê “Kemal Ebasvend” xelkê bajarê Bokanê bo cîbicîkirina heyama girtîgeha xwe bo girtîgeha wî bajarî hate veguhastin.

Ew welatiyê Kurd Befranbara îsal ji aliyê taya 101 a dadgeha Keyferî ya bajarê Bokanê ve bi tohmeta “hewildan li dijî tenahiya netewî” bi 6 meh girtîgeha te`izîrî hatibû cezadan.

Roja Yekşemî 3`ê Gelawêjê, “Kemal Ebasvend” bi bê hebûna ti belgeyek yasayî ji aliyê hêzên Îtila`ata Spaha Pasdaran ve li bajarê Bokanê hatibû binçavkirin û piştî binçavkirinê bo girtîgeha Îtila`ata Spaha bajarê Urmiyê hatibû veguhastin.
Navbirî piştî 35 roj binçavkirin bi danîna barimteya 200 milyon Tumenî bi awayek demkî heta bi dawîhatina qonaxên dadresiyê ji girtîgeha bajarê Bokanê hatibû azadkirin.

## Çar welatiyên binçavkirî bo girtîgeha bajarê Sineyê hatine veguhastin

Roja Çarşemî 27`ê Rêbendanê, çar welatiyên Kurd ên bi navên “Zanko Mes`ûdî” temen 22 salî û kurê Resûl, “Mihemed Fedewî” temen 23 salî û kurê Ebdullah, “Mihemed Mehcûr” temen 36 salî û “Rehmetulleh Salihiyan Yazîbilaxî” temen 34 salî kurê Mihemed û xelkê gundên “Milqerenî” û “Yazîbilaxî”yên girêdayê bajarê Seqizê ji girtîgeha îdareya Îtila`ata bajarê Sineyê bo girtîgeha navendî ya wî bajarî hatine veguhastin.

Ew çar welatiyên Kurd di heyama binçavkirinê de, ji destpêregihîştina bi parêzer û hevdîtina digel malbatên xwe hatibûne bêparkirin.

Roja Yekşemî 14`ê Sermawezê, “Zanko Mes`ûdî”, “Mihemed Fedewî” û “Rehmetulleh Salihiyan Yazîbilaxî” xelkê gundên “Milqerenî” û “Yazîbilaxî”yên girêdayê bajarê Seqizê, bi bê hebûna ti belgeyek yasayî ji aliyê hêzên ewlehî ve hatine binçavkirin û bo lêpirsînê bo girtîgeha îdareya Îtila`ata bajarê Sineyê hatine veguhastin.
Herwisa roja Pêncşemî 20`ê Xezelwerê, “Mihemed Mehcûr” xelkê gundê “Milqerenî”ya girêdayê bajarê Seqizê bi bê hebûna ti belgeyek yasayî ji aliyê hêzên ewlehî ve hatibû binçavkirin.

# Agirî

- Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
- www.Kurdistanmedia.com
- www.Agirimedia.org
- rojnamaagiri@gmail.com
- www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (416

## Wêneyên merasima 76`emîn salvegera avabûna Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistana Îranê







